## GULWENÎ YAN JÎ HEWRÎ Û HEVRÎN

Nexş, zexrefe, sembol, deq û hêma yek ji taybetmendiyên bawerî, fikir û şaristaniya Kurdistana mezin anku Zagros, Toros û Mezopotamya mezin e. Bawerî, fikir û felsefeya Mêhr yan Mêhra û Mêtra yan jî Mîtrayî weku bingeheke kûr, hemû ew fikir, felsefe, çand, jiyarî, şaristanî, pîrozwerî û bawerîyên Kurdistana mezin di hemêza xwe de berşên û berwate kir. Îcarê em behsa caw û qûmaşa Gulwenî yan jî Hewrî û Hevrînê dikin.



*Nîgarên Gulwenî û tava Mîtrayî ku bingeha pîrozwerî û baweriyên Kurdî ye*

**Pênasa Hevrînê**:
Hewrî yan Gulwenî yan jî Hevrîn caw û tarzeke Kurdî-Medî ye. Gulwenî yan jî hevrîn û nexşên gulîn weku raz û deq, standarteke bi hezar salan e kok û koda xwe parastiye. Gul di çanda Kurdî û bi taybetî Mîtrayî ku wê demê dînê Mîtrayî û mêhr anku Roj û ronahiyê dînê hemû xelkî bûye, gul û dar xwedî wate, raman û pîrozweriyên xwe bûne. Niha van raz û kod û nexşan li ser deqên jinên Kurd mane bi taybet li hermên Loristan, Mêrdîn û Şengalê.
Kurdê Lorî “Eta Hesenpûr” dîroknas û arkolog di pirtûka xwe ya bi navê “Pencînêy Abê Loristan”ê de dibêje: Li gor nivîsên Hîrodot, dîroka “Gulwenî-Hevrîn”ê vedigere serdema Mediyan. Her weha Eta Hesenpûr di derbarê pirtûka “Dîroka Medîyan” yê Dîyakonofê Rûsî de dibêje: Serbend beşek bûye ji poşakên jin û mêrên Mediyan. Her weha li ser şûnwarên kevirkol ên di dema Mediyan de, desmal, şal û Gulwenî hene, heta li gorî çavkaniyan, Gulwenî veigere berî Mediyan jî. Eta Hesenpûr amaje dide ku

di gorristana “Bawe Geylan yan jî Bawe Cîlan”ê ku dikeve rojavayê Dilfanê ya Loristanê, di nava gorra hejmara 2ê de engustîlkeke mefirxê dîtine nexşa mirovek baskdar li ser e di nava tavê de derdikeve û kilaş(sola Kurdî) li pî û desmal û şelwarê Kurdî jî li ber e, desmal bi ser û mil de şorr bûye, li dora kûma serê wê/î jî desmaleke Gulwenî hatiye pêçîn.
Di wê serdemê de desmal kincê jinan û mêran bûye ku dû re Gulwenî yan jî hevrînên mêran zêdetir bûne desmal û reştî.
Her weha “Elî Merdan Askerî” di pirtûka xwe ya bi navê “Edeba Zrarekî ya Loriyan” de li ser Gulwenî dibêje: parçe caweke mezin ê jinên ciwan ên Loristanê ye û carne jî mêr di dora kûmên xwe de dipêçin.

**Karanîna wê:**
Hevrîn ji aliyê hem jinên Kurd hem mêrên Kurd ve bi gelek awayên “serbend, rûbend, stûbend, piştbend, kemerbend, milbend, şal, reştî, mişkî, kinc û kiras”ê jî tê karanîn. Ew kinc û tarza xanedan, necîban, keyan û malbatên mezin ên Kurdan bûye.

**Nexşên wê**:
Nexşên ser gulwenî hêmayên her çar alî û hêmên Mêhr û Mîtrayî “as(asman), ax(xak), av(ab) û ar(agir)ê û gul, ronahî, vejîn”ê ye.
Bo zêdetir zelalî û raveya wê wêneyê “Anahîta”yê, ferîşteya av, ronahî û bedewiyê weku belgeya wê xwe dide nîşan. Zadbûn û vejîna Mêhra û Mîtra yan jî cejn û şeva Yeldayê, derketina Mîtrayê di gula Lîlûper(Nîlûfer)ê û dîmena hevînê di wêneyê Anahîtayê, hem giringî û taybetiya gulê û hem kûrahiya ronahî û vejînê şan dide ku, bawerî û dînên Kurdî hemû li ser “Vejîn”ê ava bûne, em di mijara “Donadon”ê de bi şekere û zelalî wê yekê dibînin.




*Wêne û peykera Anahîta devera Berze Qebaleya Loristanê û jin Kurd bi kincê Gulwenî*

**Navê wê**:
Li herêmên Lor, Kelhor, Lek, Bextiyarî û Kehkîlûyê jêre "Gulwenî"yê tê gotin, li nav Soran, Mukriyan, Erdelanê de "Hewrî" tê gotin, li nav Ûramûnî(Hewramî)yan de zêdetir Hewrî yan Şedde" tê gotin, li nav Kurdmanciyan de jî "Hevrîn" têgotin

**Sondxwarin**:
Li herêma Lek, Kelhûr, Bextiyarî û Loristanê sê sond xwarinên taybet hene ku girêdayî heman çand, bawerî û pîrozweriyê ne, ew jî sond xwarine bi "gul"ê, bi "keziyên dayikê" û bi "serwena dayik" weku dibêjin: "We perrî serwenî dallk im qesem"
Di dema Mediyan de wê nexş û stîlê derket û peyda bû bi taybet li herêma Loristanê ku ta niha jî eynî ye.

Lêkolîn û Nivîsîn: **Qendîl Şeyxbizînî**